

Almanî dixwazin zêdetir ji berê hember Îslama Siyasî derkevin

»»» R:7



Remz û nîşana netewî

»»» R:4

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyayî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (412) 22-12-2021 Buha (1000) Tûmen

Jêopolîtîk û curên vê beşa 3

»»» R:5

Lihevhatinên herêmî û paşeroja pirsê gelê Kurd

»»» R:8

Pêşmerge bo serbestiya nîştimanê canê xwe gorî dike

Roja Pêncşemî 25`ê Sermaweza sala 2721`an, li yek ji binkeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê rêûresmek taybet bi 26`ê Sermawezê, ku weke roja Pêşmerge Kurdistanê hatiye diyarîkirin bi rê ve çû.

Di vê rêûresmê de parek li endamên rêberayeti, kadr, pêşmerge û malbatên Partiya Demokrat beşdar bûn.

Rêûresm bi xwandina sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina biştek bêdengî bo rêzgirtin li canê pak ê şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê ji aliyê birêveberên rêûresimê ve hate destpêkirin.

Peyama Dezgeha Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê ku taybet bi roja Pêşmerge bû, ji aliyê rêzdar “Kawe Behramî” Berpirsê Dezgeha Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê hate pêşkêşkirin.

Di vê peyame de tevî îşarekirin bi dewr û rola pêşmerge û pênaseya pêşmergebûnê û codahiya pêşmerge digel çekdarên din hate behskirin. Her-



wisa di vê peyame de ev yek jî hatibû behs kirin ku: “Pêşmerge mirovek aza û siyasî û hişyarê civaka kurdistanê ye ku, bo bideştveanîna maf û azadiyên gelê kurd li dijî dîktatorî û kevneperestî û nadadperweriyê sekiniye. Coda-hiya çeka pêşmerge digel çekdarên girêdaiyî dîktatoriyê di vê yekê de ye ku pêşmerge cengaverê şereke adilaneye û herwisa armanca wî rizgarkirina gelekê ye lê, çekên dîktatoran bo zêdexwazî, bînpêkirina maf û azadiya gelan e, bitaybet çekdarên komara îslamî ku çeka teror û kuştin, îdamkirin û malwêraniya gelên Îranê girtine destê xwe.

Di berdewamiya peyama Dezgeha Fermandehiyê de behsa qonaxên coda ên xebata pêşmerge û çawaniya hatina gorê a rojek weke roja Pêşmerge hate kirin. Hêjayê basêye ku di beşeke din a vê peyame de behsa Rasana Rojhilat û erka pêşmerge di vê qonaxa nû a xebatê de hate kirin.

Di beşeke din vê peyame de hatiye behs kirin ku: Rewşa xebatê li rojhilatê Kurdistanê, ev yeka nîşana me dide ku, hewceye careke din hêza pêşmerge kurdistanê bi gir û teneke coda, bi li berçavgirtina rewşa kurdistanê hûndirî qonaxa nû a xebata rojhilatê kurdistanê bibe.

“Her di vê barê de, rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê di sala 1394`an de û di civîna pilinyûma Komîteya Navendî de bi mibesta bihêz-kirina xebat û hebûna çalakane a pêşmerge di navxweyî welat de ev pirsê girîng anî ber bas û piştê li newroza sala 1395`an de, sekreterê giştî yê vê partiyê mizgîniya xebateke bi bê qutbûn ragihand ku encama vê Rasana Rojhilatê bû.”

Di dirêjahiya vê rêûresma taybet a Roja Pêşmerge de, sirûdek ji aliyê koma hûnerî a partiya demokrat hate pêşkêş kirin.

Di beşeke din a vê rêûresma taybet de, ji pêşmergeyên ku heyama 20 salan di nav refên xebatê de bûne rêz ji wan hate girtin, hêjayê basêye ku di vê para rêûresmê de weke edeta her sal a Partiya Demokrat, levheya rêzgirtinê ji aliyê “Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê` ji wan pêşmergeyan re hate dan.

Ev pêşmergeyên ku di vê meha Sermaweza îsal de, heyama 20 salan bi ser pêşmergebûna wan di nav refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê de derbazbûye û rêz li xebata wan hatiye girtin wuha ne: “Kerîm Perwîzî, Tahir Mehmûdî, Sma`îl Rehmanî, xatûna Ferîde Husênzade, Ferzad Rezayî, Husên Aqayî, Kêyvan Fatihî, Reza Pîrûzî, Rêbvar Ebîdî û Rehm-an Xefûrî”.

Herwisa di beşeke din a vê rêûresmê de bi hilkefta Roja Pêşmerge Kurdistanê, ji pêşmergeyên bi navê “Diyako Mes`ûdî û Şaho Xefûrî” kardên perwerdehiyê ên Dezgeha Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê, ji aliyê “Mihemed Nezîf Qadirî”, cêhگیرê duyem yê Lêpirsyarê Giştî levhên rêgirtinê ji wan re hate dan.

Di berdewamiya vê rêûresmê de pexşanek ji aliyê “Êhsan Reştigar” pêşmerge kurdistanê ve hate xwandin.

Di dawiya vê rêûresmê de, du pêşmergeyên hûnermend ên bi navên “Nizam Secadî û Ce`ifer Doştalî” şranek pêşkêş kirin.

Sergotar

Dengê heq nayê fetisîn

N: Kerîm Perwîzî

Wênayek dîrokî ye, sê nîfş li pey yek; Yek bapîr e ku piştî wî li wênayê ye, evê din zarokek e û li ser axa gorekê di nav hizir de ye. Kesê sêyem di bin axê de ye û li dilê nîştiman de cih girtiye. Bavê şehîd digel kurê şehîd “Elî Qurbanî” li ser tirba pîroz a şehîdê ezîz yê xwe rûniştine û her yek ji wan dîtingehê bo jiyane heye, yekê derbas kiriye û yê din bi vê bûyerê tete vejîn.

Dema xwe desthilatdarên serkutkar ku nedixwaştin dengê heqbêj bibihîzin, Mensûr Helac bidar vekirin; ev bi tawana vê ku digot “Êna El-heq” îdam kirin. Wan wisa dîzanîn ku sêdaredan rêya çareseriyê ye bo nebîhîstî û reşkirinê, çimkî tirs û jînavçûn tev wataya jiyana wan dagîr kiribû û tenê û tenê tamkirineke asayî ji xwenê li cem wan girîng bû, lewma wan wisa dîzanî ku bi sêdaredanê ew dê xelkê bitirsînin û pê vê yekê “heq”ê dîkujin.

Fermandarên ku “Mensûr Helac” dar vekirin, mirin û bi serşûrî ve ji nav çûn û navê wan bo heta hetayî wek kabûsê di dîrokê û hikayetan de tete gotin. Navê Mensûr Helacî jî bi ser dara serbestî ye û banga “Ene El-heq” çirke bi çirke di guhê azadîxwazan û heqbêjan de dibêje û dengvedana dengê mafxwaziya şoreşvanan heta hetayî diçe guhê nîfş li pey nîfş de. Piştî sedan salan, li ser heman korsiya serberedayî û zilimker, tarîkbîrên Cemarane rûniştin û fermana bidarvekirinê didin. Ew wisa dîzanîn ku ger kurê şehîd Elî îdam bikin, êdî karê wan tevav e û dengê heqbêjî tete birîn.

Wan wisa dîzanî ku kuştina şehîd Elî û şehîdên din, neteweya Kurd û Kurdistanê

Peyama pîrozbahiya “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta 26`ê Sermawezê



Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta 26`ê Sermawezê roja Pêşmerge Kurdistanê, peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Pêşmerge remza xweragiriya netewa me ne, lewma cihê şanazî û serbilindiya me ne.

26`ê Sermawezê roja Pêşmerge Kurdistanê, pîroz be li hemû xelkê Kurdistan û li hemû pêşmergeyan ku li çepera çiya û bajar de bi bexşîna canê xwe berevanî li mafê gelê me dîkin.

Lêpirsiyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

bêdeng û sertewîner dîkin û bo serkutkarên Tehranê serê wan tete tewandin, lê kurên şehîdan û xorên gel pêgihîştin û Heyder hate meydanê da ku dengê heq bêje. Vê carê tarîkbîrên Cemarane û kopalbidestên wan wisa dîzanîn ku tenê karek maye û ew jî kurê şehîd îdam bikin da ku tovê serbilind û mafxwazî di Kurdistanê de ji nav bibin.

Roja Yekşemî 28`ê Sermawezê 1400`an a Rojî, fermana mirina wî dan, lê bixwe bi dana wê fermanê be`ecî bûn! Her lewma di tarîtiya şevê de û bi dizî ve Heyderê kurê şehîd û xortê nîştiman û rêvîngê Qasimloyê nemir şehîd kirin û her bi dizî ve termê wî kirine nav axê, çimkî li dengê şehîd Heyder ditirsiyan.

Lê wekî hertimî nedîzanîn ku heq nayê îdamkirin, belkî bi êrîşkirin bo ser heqîqet dibine sedemê zêdetir û berfirehbûna dengê heqîqet û heqbêjî, û her heman rojê xelkê Kamêranê li ber mala şehîd Heyder kom bûn û hawar kirin şehîd nemir e wekî çiya, wekî bajar, wekî vejîna xebatê û wekî serhildana nîfşa xebatkarên netirs û wekî vizeya Rasanê.

Peyama Mistefa Hicrî li derheq sêdaredana Şehîd Heyder Qurbanî

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Mistefa Hicrî”, li derheq sêdaredana şehîd “Heyder Qurbanî” ji aliyê rejîma mirovkuj a Îranê ve peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Rejîma mirovkuj a Komara Îslamî “Heyder Qurbanî” xortekî dinê yê nîştimana me îdam kir.

Heyder Qurbanî kurê şehîd Elî, azadîxwazek welatparêz û zîrek bû ku wekî pira-niya xortên Rojhilatê Kurdistanê serê xwe li hember rejîmê de netewand û bi vî awayî bo heta hetayî xwe xîste nava dilê nîştiman û



nîştimanperwerên Kurdistanê.

Kurdistan bi hebûna wan xortane serbilind e û dilê wê bo azadiyê pir ji hêvî ye.

Ez sersaxiyê dibêjme malbat û kesûkarên şehîd Heyder û hemû xelkê emegdar û xebatkar ên bajarê Kamiyaranê û hemû evîndarên azadiyê li Kurdistanê.

Şermezarî û neman bo rejîma Komara Îslamî

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ

Mistefa Hicrî

20`ê Kanûna Pêşîn a 2021`an

Heyder Qurbanî girtiyê siyasî yê Kurd li girtîgeha Sineyê hate îdamkirin

Sibêdeha îro Yekşemî 28`ê Sermaweza 1400`an a Rojî, “Heyder Qurbanî” kurê “Elî” û girtiyê siyasî û xelkê bajarê Kamiyaranê, ji aliyê rejîma Îranê ve li girtîgeha bajarê Sineyê hate îdamkirin.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, berpirsên rejîma Îslamî li girtîgeha Sineyê hikimê wî girtiyê siyasî yê Kurd demjimêr çarê sibêdehê cî bi cî kirine; Hevdem yek ji birayên “Heyder Qurbanî” ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hatiye binçavkirin.

Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê li gor çavkaniyek agehdar belav kiriye: “Hêzên ewlehî û Îtîla`atî yên rejîmê, ji tirsê xelkê ve goriştana “Bizweş”ê ya ser bi Kamiyaranê mîlîtarîze kirine”.

Berê sedan welatîyên xelkê Kamiyaranê bi wajokirina nameyekê rû li rêberê rejîma Îranê, daxwaza hilûşîna hikimê îdamkirina “Heyder Qurbanî” kiribûn.

Roja Duşemî 18`ê Gelawêja îsal, malbata wî girtiyê siyasî serdana dadguşteriya giştî ya parêzgeha Sineyê kiri-



bûn û bi malbata navbirî re hatibû ragihandin ku daxwaza cîbicîkirina maddeya 477 a yasaya oliya dadresî ya “Keyferî bo “Heyder Qurbanî” hatiye redkirin û dosiye ya navbirî bo cîbicîkirina hikimê wî bo taya birêvebirina hikimê dadgeha Înqîlab a bajarê Kamiyaranê hatiye veguhasîn.

“Heyder Qurbanî” girtiyê siyasî yê temen 48 salî û xelkê bajarê Kamiyaranê ser bi parêzgeha Sineyê meha Rezbera 1395`an a Rojî, ji

aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve bi tohmet “hevkrîkirin di kuştina çend kes ji bikirêgirtiyên rejîma Îranê” de hatibû girtin.

Meha Reşemeyê heman salê televîzyona Îngilîzî ziman a “Pres Tv” a ser bi rejîma Îranê bi nîşandana dêkomînterek bi navê “Ajotvanê Merg” beşek ji îtirafa bizorê ya wî girtiyê Kurd belav kir.

Heyder Qurbanî, 14`ê Rezbera 1398`an a Rojî, bi tohmetên “lêdana fîzîkî û

birîndarkirin bi çek, beşdarî di kuştina bi zanebûn, hewildan û revîn ji peyketin û hikimdan û cezadan, hevkarî li kuştina bi zanebûn, destpêka kuştina bi zanebûn, guherîna pilaka maşînê, dizîna mirovan û wergirtina malê dizîvê, hevkarîkirin digel yek ji Hizbên Kurdî ên opozsiyonên dijberên rejîma Îranê” di taya 1 a dadgeha Keyferî ya Sineyê de hatibû cezadan.

Ew girtiyê siyasî yê Kurd di dadgeha taya 1 a Keyferiya Sineyê de bi sê car girtîgeha te`izîrî her yek ji wan 30 sal girtîgeh hatibû cezadan.

Heyder Qurbanî, roja Sêşemî 8`ê Rêbendana 1398`an a Rojî, ji aliyê taya 1 a dadgeha Înqîlab a Sineyê ve, bi tohmeta “bexî, hilgirtina çekê li dijî rejîmê û nîzama rejîma Îslamî” bi îdamê hatibû cezadan.

Berê jî Saziya Efûya Navnetewî û gelek rêkxi-rawên mafê mirovî û kar-nasên Saziya Netewên Yekgirtî teîd kiribûn ku “Heyder Qurbanî” girtiyê siyasî yê Kurd di bin îşkenceya hêzên rejîma Îranê de rastî îtirafa bizorê hatiye.

Remz û nîşana netewî



N: Nûredîn Sofizade

Li her cihekî vê cîhanê de û li her welatekê de û di nava her netewe de û herwisa hinek caran li girûpekê de jî, hinek pîrozî hene ku ew welat an netewe an girûp û civatgeh, jê xwedî der dikevin û bo xwe pîroz dizanin.

Ew pîrozî renga nîşanek be, renga Ala be, renga navek be, yan baweriyek be ku xelk peyrewiyê jê dike, lewra hekî sivkatî pê bê kirin, ew welat an netewe an civatgeh, vê sivkatiyê bi xwe dizane. Di nav gelê Kurd de jî gelek remz û nîşan û baweriyên pîroz hene, weke navê Kurd û Kurdistan, Ala, Şehîd, Pêşmerge û rêberên tevgera rizgarîxwaziya Kurd, sirûda nîştîmanî û ...hwd û ew milkê netewa Kurd in.

Her kes, alî, netewe û dewletek bixwaze sivkatiyê bi wan hêmayên pîroz bike, li esla xwe de dijminayetiya hemî gelê Kurd û pîrozibahi-yên netewî dike.

Cem her welat û neteweyekê tişta herî pîroz, serweriya netewî û Ala netewe ye; neteweya Kurd jî ku weke neteweyeke bin deşt ku ev sedan sal e cehd û xebatê dike da ku wekî hemî neteweyên din ên xwedî serwerî, bigihîje mafê xwe û şerê rizgariyê dimeşîne, em dibînin ku her li serdema Mîr Bedirxan Paşa ve bigre heya digîje serdema şoreşa Araratê û piştî jî bi avakirina Komara Kurdistanê, wekî nîşan û remza netewî Ala Kurdan hatiye diyarîkirin.

Piştî wê ku li sala 1945'an li Rojhilatê Kurdistanê Partiya Demokrat amadekarî dikirin bona avakirina dewletekî

Kurdî li şiklê Komarî de, roja 17'ê Kanûna Pêşîn a 1945'an, an ku 26'ê Sermaweza 1324'an, bo yeke-mîn car Ala Kurdistanê hate hildan, bi derbazbûna mehek û 6 rojan li ser avakirina Komara Kurdistanê de, ew Ala bû Ala Komarê û Ala Netewî. Piştî têkçûna Komarê heya rizgariya başûrê Kurdistanê di sala 1991'an de, careke din hildana Ala Neteweya Kurd, xewn û hêviya her Kurdeke welatparêz bû, Piştî pêk hatina dewleta Kurdan li başûrê Kurdistanê, di sala 1999'an li Parlemana Kurdistanê de, Ala Kurdistanê hate diyarîkirin û piştî jî aliyê Parlemana wê beşa Azad a Kurdistanê ve roja 26'ê Sermawezê weke roja Alaya Kurdistanê hate diyarîkirin.

Ji vê demê şûnda, her Kurdekî welatparêz ku dilê wî bo rizgariya Kurd û Kurdistanê lêdide û ew Ala û roja Alaya Kurdistanê bi ya xwe zanîne û weke remz û nîşana netewî hildane û pîroz kirine.

Ala Kurdistanê netenê di Kurdistanê û ji aliyê gelê Kurd ve wekî remza netewî bi fermî hatiye naskirin, belkî Ala Kurdistanê zêdebarî ewê ku Kurdan dewleta serbixwe ya xwe çinînin, lê dîsan jî em dibînin ku di asta hemî cîhanê de û ji aliyê piraniya welatan ve, wê Alaya pîroz weke Ala Kurdan nas dikin û li dîplomasiya Herêma

Kurdistanê de li gel welatên herî bihêz ên wekî Amerika, Russia, France, Germany, British, Chin û ...hwd, Ala Kurdistanê li kêlega Ala wan welatan de tê hildan.

Fermîbûn û pîrozbûna Ala Kurdistanê, gelek caran ji aliyê hikûmetên dagîrker ên Kurdistanê ve jî êtiraf pê tê kirin ku li hevdîtînen deshilatdarên Herêma Kurdistanê de bo Turkiye û rejîma Îranê, her çiqas bo hikûmetên wan welatan wekî wexwarina cama jehrêye jî, lê dîsan em dibînin jib o pêşwaziya li berpîrsên Herêma Kurdistanê, Ala Kurdan li Tehran û Enqerê tê hildan. Ala Kurdistanê di yasaya bingehîn a hikûmeta federal a Îraqê de wekî Ala Kurdistanê bi fermî hatiye tomarkirin û naskirin.

Bi li berçavgirtina wan rastiyan ku li jorê amaje pê hatne kirin, rewayet û pîrozbûna Ala Kurdistanê weke remza netewî, çi şik û guman namîne û doşt û heta welatên dijminê kurdan jî ew Ala bi fermî naskirine û îtiraf pê kirine.

Ala Kurdistanê ji aliyê neteweya Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê wekî Ala netewî tê zanîn û di piraniya minasibetan de, ew Ala li her derî tê hildanê. Lê ya cihê mixabiniyê eve

ku hindê caran em dibînin û dibihîsin ku ewên dijayetiya Ala Kurdistanê dikin, navê Kurdbûnê li ser wane, ew kes û aliyên ku îro rojê dijayetiya Ala Kurdistanê dikin, û hildana Ala Kurdistanê qedexe dikin, bi sûça hildana Ala Kurdistanê li salroja Alayê de, êrîşê dibin li ser xortên Kurd û xwîne li serê wan diberdin û wan digirin û îşkence didin.

Îro rojê dewletên wekî Îran û Turkey û Iraqê bi awayekê rêz ji vê nîşana neteweya Kurd digirin û dizanin ku dijayetiya kirina vê Alayê dijayetiya hemî Kurdane, lê hinek binav kurdên ku şoreşgerbûna xwe kirine dukan û bazar, hevşeweyê dijminên herî xedar, Ala Kurdistanê dişevitînin û bi hinceta hildana Ala Kurdistanê, xortên Kurd di xwîne de sor dikin, bê guman ew tenê dijayetiya Ala Kurdistanê nîne, belkî dijayetiya navê Kurd, Kurdistan, pîrsa netewî, pêşmerge, axa Kurdistanê, sirûda netewî û hebûna pîrsa Kurd e.

Bêguman dijayetiya ku li hember Ala Kurdistanê tê kirin, renga li kolanên Tehran, Enqere û Bexda û Şamê de, bi vî awayî li dijî Ala Kurd û Kurdistanê nehatiba kirin. Dema her pîroziyekî Kurd û Kurdistanê cem te qedexe be, kerema xwe bêje kanê nîşana Kurdbûna te çi ye?



Jêopolîtîk û curên vê beşa 3



N: Bêhzad Qadirî

W: Bêhzad Simko

Jêokultûr

Yekem car çemka jêokultûr an ku jêopolîtîka çandî di sala 1984'an de ji aliyê aborînasê Amerîkayê yê bi navê "Immanuel Wallerstein" li derheq şirovekirina nizama cîhanê, hate gorê. Ew nêo-marksîst bû û wisa hizir dikir ku li sedsala 16'an şûnda, nizama cîhanî deşt bi ser cîhanê girtiye û nevendeke vê heye ku cihê berhem anîn an zêdekirina dahatan û bintarek heye ku cihê dabînkirina hewcehiyan û madeyên deşpêkî ye û ew teoriya piştî di bin navê "Jêopolîtîk li ser hêza çandî" xistîne ber bas.

"Immanuel Wallerstein" li ser vê baweriyê bû ku wê nizama, taybetmendiyek çandî heye ankû çanda xwe bo cîhanê verê dike, ku jêra jêopolîtîka çandî tê gotin. Jêokultûr li ser esasên tovên çandî cihgîre ku ku pêka teoriya "Navend-Derdor" a "Immanuel Wallerstein" bi vî coreyî ku madeya deşpêkî û hêza mirovî û... hwd ji derdor ve diçine nav navendê, çand jî li navendê çêdibin û derzî nav civaka derdor, anku tiştê çandî bi rêya peyamên çandî ve ji binyatên çandî çêdibin û belav dibin. Binyatên çandî (mûzîk, sînema, rojname û ragihandin, pertûk û ...hwd) li navendên moderin (Geşekirine) ve ber bi derdora (di rewşa geşekirinê) dimeşin û peyamên çandî dinêrin. Îro di welatên ku kêmineyên netewî, qewm û netewe di bin dagîrkeriya netewên serdest de ne, asmîlekirin û mehandina netewên jêrdest bi rêya çandî, kêmtirîn helwêsta cîhanî li pey xwe hedibe û pêka vê yekê, siyaseta her-



timî ya hikûmetên navendî di deverên weke Kurdiştanê de, li ser jinavbirina çandê tekezî dike.

Jêokultûr çemkeke bîranîna rol û bandora sedemên çanda deştilatdar û welatekêye an jî pêkhatiya şariştaniyetikê di rûberûbûna digel çandên din de. Eger ji dîtingeha jêokultûrê ve mêzeyê boneyên çandî ên di navbera netewe û welatên cur bi cur de bikin, welatek ji aliyê çandî ve dibe bi serdest ku şiyana şandin û hebûna bandora çandî li warên cur bi cur li ser welatên din de. Îro pêverên çandî ên rojavayî û Amrîkayê, seranserê cîhan li xwe girtiye û tevahiya welat û çandên din di rikeberiya digel çanda rojavayî rewşa berevaniyê dane berahîka xwe.

Jêopolîtîka jîngehî

Ji pêwendiya di navbera rewşa çavkaniyên jîngehî û çavkaniyên jiyanê ên digel ewlehî û siyaseta navnetewî û netewî, jêopolîtîka jîngehê tê gotin. Di îrojro jê de bi sedema kêmbûna çavkaniyên jîngehî û peydabûna metirsiyên jîngehî ên weke (gerimbûna erdê, levitîna hewa, jinavçûna dariştanan, zêdebûna heşîmet, hejarî û ... hwd), rol û girîngiya çavkaniyên jîngehî û guherînên deverê, çendîn hember bûne û civaka cîhanî ji nîveka sedsala 20'î de, pîrsa jîngeh û guherînên deverê weke metirsiyek micid hesibandine û çendîn konferans û civînên girîng ên cîhanî di wê derheqê de hatine lidar

xistî.

Kêmbûna çavkaniyên jîngehî û gefa jinavçûna corên giya û jîndaran û herwisa pîsbûna jîngehê, girêdana rikeberiya di navbera welatan û heta deverên cur bi cur ên welatekî li xwe girtiye û ew rikeberiyane di çarçoveya jîngehê de tene gengeşekirin.

Jeopolîtîka kêmineyan

Kêmine li hember zêdebûnê de wate dide, kêmine di çarçoveyekê de wek "Welat, Bajar, Melbenda hevpar, netewe, civak û ...hwd" li hemberî beşek mezintir ankû zêdebûnê de cih digire. Kêmine hinek taybetmendiyên wekî ziman, etnîk û Ol li xwe digre ku nasnameya binavkirî li derheq derdora xwe gengeşe dike. Kêmine bi giştî di rewşeke dûrxistî de cih digre û li warê deşpêregihîştin bi pêgehên siyasî, civakî, komelayetî, aborî û civakî, heta asteke nizîmtir ji zorîneyê cih digre.

Kêmine bi du şewazan tê pênase kirin: Kêmineya ekolojîk û kêmineya sosyolojîk

Kêmineya ekolojîk ji wan core kêmineyan re tê gotin ku bi şewazek yekgirtî li melbend û cografîyaya dîroka xwe de dijîn. Ew girûpên kêmineyan ku di melbenda xwe de zorîne ne û digel jîngeh û cografîya xwe de pêwendiyên ekolojîkî pêk anîne û di vî pêwendiya ekolojîkî de binyata anîna ziman a daxwazên bajarmendî û nasnameyan bo xwe dabîn

kirine.

Kêmineyên komelayetî an sosyolîjîk, bi deşteyek li kêmineyan tîn gotin ku melbend û cografîyayek taybet bi xwe tinînin û bi awayek berbelav li bajar û deverên din de belav bûne. Li îro şûnda piraniya koçberên welatên cor bi cor li welatên Ewropayî, di bin navê kêmineyên komelayetî ankû hemen sosyolojîk de ne. Jêopolîtîka zaniyarî Jêopolîtîka zaniyarî mijarek nû ye li jêopolîtîkê. Li dîtingeha bisporên wî warî, pêwendiyek bi wate di navbera serdestî li hêz digel asta bilind a zaniyariyên zaniştî û zaniştî mirovî de heye. Di dîtingeha jêopolîtîka zaniyariyê de, welatên ku asta zanişt û zaniyariyên wan li asteke bilind de ne, ji aliyê hêz û bi sedema rikeberiya digel hêz û welatên din, pêgehek servetir hene. Jêopolîtîka zaniyariyê li ser rola zanişt û zanayî li ser hêzê lêkolînan dike. Di baştirîn zanîngehên modern de, navendên zaniştî, govarên bi navûdeng, alavên ragihandinan û teknolojiyên nû li warê zaniyariya gihandinê, di xizmeta hêza serdest de ne.

Jêopolîtîka wize

Li îro şûnda rola wize di jiyana mirovan de gelek berçav e. Pîşeyîbûna cîhanê bi bê çavkaniyên wizeyê nemumkin e. Îro di hemû aliyên jiyana mirovan de li aliyên cur bi cur (pîşe, cotyarî, gerimkirin û hênîkirin, berhemanîna xwarinan, hatûçûn, leşkerî, çalakiyên pizîşkî û dermanî û lêkolînen zaniştî) de bi awayê raasteraşt girêdayî çavkaniyên wizeyê ne. Pêka vê yekê, welatên ku ji aliyê çavkaniyên wizeyî ve şiyaneke zêdetir hene, ji aliyê hêza netewî û rûberûbûna digel pîrsgrîk û lemperan, bi berhevdana liçav welatên din ku şiyaneke kêmtir hene û di pêgehek bihêztir de ne. Jêopolîtîka wize bas ji rola û bandora wize û pêgehên cur bi cur ên li bara siyaseta, hêz û boneyên cur bi cur ên netewe û dewletan dike.

Rêberek ku hizrên wî bûne rênîşander




N: Sîmîn Rûhanûzade

Ger em mêzeyê dîroka siyasyî ya cîhanê bikin, em dibîbîn ku di nava parek ji gel û welatên cîhanê de hin kes hene ku navê wan bûne hêma û simbol di nava dîroka gelê wan de û ew kesên xwedî nav bûne rênîşanderê gel û civaka xwe û rêya serkevtinê bo gelê xwe diyarî kirine; bo mînak heta îro jî, Hindûstan di cîhanê de bi “Gandî” ve tê nasîn û bîr û bawera Gandî bi demokrasî bûye sedem ku Hindûstan niha bibe mezintirîn welatê demokrasî di cîhanê de; yan di welatên yekgirtî yên Amerîkayê de heta îro jî navê “Coric Waşingtî” û “Abraham lînkoln” tê xuyakirin û gelek kesayetî û navên din hene ku bûne rê û rêbaz bo gel û welatê xwe.

Pirsek ku bo mirov çê dibe eva ye ku çî tiştêk û çî fakterek dibe sedem ku nav, jiyan, reftar û bîr û bawera wan kesan bibe rênîşanderê bo nîfşên din di civakê de. Qehremanî, egîdî, endîşe û bîr û bawerek qahîm, jêhatîbûn, mirovdustî, şiyana rêberayeti, nîştîmaperwerî û... hwd ji wan fakteran in ku navê wan kesan bo hertimî zindî radi-gire.

Gelê kurd sedan sal e bo rizgariya netewa xwe xebatê dike û di nava gelê kurd û civaka Kurdistanê de jî sedan kes hene ku rol û bandorek taybet li ser pêşvebirina civaka Kurdistanê hebûne, û navê wan heta niha jî di dîroka Kurdistanê de zindî maye; mînakek bo wan kesan “Simkoyê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Şêx Mehmûd, Dr.Qasimlo, Dr.Şerefkendî” û sedan kesên din.

Emê li vir de bas ji kesyeti-yekê bikin ku bi mamostayê



demokrasiyê hatiye naskirin û xwedî kesayetiyeke navnetewî ye ku di cîhanê de bi hêmaya kesek ku bawerek kûr bi rizgarî û azadî di cîhanê de û bitaybet di Kurdistanê de heye, hatiye naskirin û navê wî di nava gelê Kurd de jî bi pêxemberê aştiye zindî maye û bîr û bawer û hizra wî bûye rêbaz û rênîşanderê geleke, ev kesê xwedî nav û rêbaz “Dr.Ebdulrehman Qasimlo” ye, rêberê navdar û nemir ê gelê Kurd.

Niha pîris eva ye çî fakterek û taybetmendiyeke bûye sedem ku navê “Dr, Qamilo” hertim zindî bimîne û bibe hêmayek bal her takekê Kurd û wekî rêberekê navê xwe di nava dîrokê de tomar bike.

Bo eva ku takek bikare bibe rêber divê xwediyê du taybetmendiyan be yekem; şarezayî di hizrîn yan bêjîn bîrmendbûnê de. Duyem; hebûna şarezayî û şiyaneke taybet di kar û reftarên siyasî yan bêjîn hûnera siyasî hebe, bi awayekê ku rastîyan bi başî binase û xwe digel wan de rêk bixe.

Pirsiyar eva ye ku axo “Dr.Qasimlo” xwediyê ew taybetmendiyan bû yan ne? Mînak gelek in bo vê yekê, lê em gelek dûr naçin, tenê mêzeyê 10 salên dawîya jiyana Qasimlo bikin, dibîbîn ku gelek fakter hene ku bersiva pirsîyara me dide, yek ji wan di dema serkevtina şorişa gelan di Îranê de, Dr. Qasimlo karî bi têgehiştinên xwe yê siyasî û bi carek din anîna Hizba Demokratê bo nava meydana siyasî, heybeta xwe di sê fakterên zanayî, şiyana rêberiyê û karîzmabûnê de bo doşt û dijminan di wê demê de da xuya.

Zanatiya Qasimlo bo wê yekê dizavire ku cuda ji kesayetiyeke din yê di nava şoreşan de zaniyarî û agehdarî li ser ew hizrên cuda yê ku di nava civakê de hakim bûn hebûn, herwisa zaniyarî li ser ew hizran jî hebû ku dikarî bibine jêrxanek baş bo berdewamiya şoreşê, herwisa şarezayî û têgehiştin li ser siyasîyên navdewletî û pêwendîya di navbera hêz û siyasîyê de jî hebû, taybetmendiyeke din yê Qasimlo hizir û endêşeya wî ya nû bû ku ji her kesekê cudtir bû û ew endêşeya wî çarçoveyek nû a hizirî bi şoreşa Kurdan bexişt.

Dawî taybetmendiyeke Dr. Qasimlo eva bû ku dîplomaseke zîrek û aza bû, û şarezayê hemû pîren-sîp û binemayê gotûbêjê bû.

Evên ku hatine baskirin tenê beşek kêmbûn ji taybetmendiyeke Dr. Qasimlo; Dr. Qasimlo tenê kesek nebû, ew mamoste û rêberek bîrmend, siyasîvan, dîplomat û darêjerê hizrekê bû ku mirovên Kurd û şoreşa Kurdan girêdida bi cîhanek pêşketî ve.

Wane, hizir, endîşe û rêbaza Dr.Qasimlo niha piştî derbasbûna sê dehikan bi ser şêhîdbûna wî ve hêştî rênîşanderê rêvîngên rêya azadî û rizgariya Kurdistanê ne.

Nerîna Lîderan



“Anthony Blinken”:

“Dema rêkvevartin digel Îranê gelek kêr e”.



“Isaac Herzog”:

“Divê bi her nîrxekê be em rê nedîn Îranê çeka navkî berhem bîne”.



“Muîn Ebdulmelek”:

“Ti caran aşti dîtingeha Îran û Hûsiyan nebûye”.



“Mehmed Ebaszade”:

“Hizira Îranê di danûstabinên digel welatên Rojavayî de diyar e û divê ew tehrîmên li ser Îranê rabikin”.

Almanî dixwazin zêdetir ji berê li hember Îslama Siyasî derkevin



N: Eskender Ceiferî

Berî du heftiyan hin çalakvanên Almanî ji hikûmetê xwaştin rêkarên tundtir bi kar bîne ji bo ku rê neyê dayîn Îslama siyasî li vî welatî pêş bikeve.

Ew çalakvan dibêjin ew kesên ku ji 2020'an ve heya dawiya 2021'an ji ber tundrewiyê hatine girtin, qet nehatine sizakirin.

Berî niha sala 2020an jin û zilamek hevregexwaz li navenda bajarê Dresdenê rastî êrîşê hatin ku di encamê de yek ji wan li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Ev kiryar û sedemên wê, beriya niha ji aliyê hêzên ewlehî û polîsan ve weke gefên îslametiye hatibûn binavkirin.

Roja 16ê Çiriya Pêşîn a 2020an mamosteyekî dirokê ji aliyê îslamgîrek 18 salî ve li Conflans-Sainte-Honorine li bakurê rojavayê Parîsê hate kuştin. Ew ji ber nîşandana karîkatoreke Mihemed hate kuştin ku di kovara Charlie Hebdo de hatibû belavkirin. Wî mmamosteyî li ser mijara azadiya nerînan bi xwendekarên xwe re gotûbêj kiribû lê belê resmandina Mihemed ji dîtingeha şerîeta wan ve qedexa ye. Di encamê de jî bavê xwendekarekê û tundrewê îslamgîr Fetwata kuştina wî mamosteyî dan.

Roja 29ê Çiriya Pêşîn a sala 2020an 3 kes li kilîsayekê li Nizza hatin kuştin û 6 kes jî bi tundî hatin birîndarkirin. Tawanbar piştî ku hate girtin, hewara “Ellaho Ekber” hilda.

Ew çalakvan niha piştî salekê dibêjin me sala 2021 jî qedand lê hîn wek pêwîst



Îslama siyasî li Almaniya nehatiye sînordarkirin.

Mezintirîn rêxistina sîvîl ya Almaniya ku wek Hevalbendên Çep tê naskirin, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihand ku ew lîdîr belavbû Îslama Siyasî ne û ew dixwazin rê li ber belavbûna Îslamê li wir bê girtin.

Wan di destpêka daxuyaniya xwe de gotin ku em pir ditirsin ji ber ku xelk bi sedema hizrên nemirovane tên kuştin. Em aciz in ji ber ku ti rexneyek nayê girtin.

Jin û zilamek hevregexwaz li Dresdenê rastî êrîşê tên lê belê ti kesek dengê xwe hilnade. Serê mamosteyekî li Fransayê tê jêkirin lê di sa jî hemû bédeng in. Êrîşek li Nizza bi kêr yan jî satorê hatiye kirin lê belê heya niha di derbarê wê de ti tiştek nehatiye gotin. Bédengî heye ji ber ku rê nayê dayîn bi mafên kesên din bileyîzin. Em li vir dibêjin: Êdî bes e!

Hevalbendên Çep di beşeke din ji daxuyaniya xwe de gotin ku em naxwazin bédeng bimînin û lewma jî bi awayekî eşkere dibêjin: Îslamgîrî, li dijî mirovahiyê ye.

Kuştinên heftiya derbasbûyî jî, ji vî yasayê cuda nebûn. Ew jî bi armanca pêkanî û bikaranîna tundrewiyê bûn ku ji aliyê hin kesan ve hatin encamdan û di encamê de hin kes, ji mafên xwe yê mirovahiyê tên bêparkirin.

Di berdewamiya daxuyaniyê de daxwaz ji Almanyayê tê kirin ku ne pêşiya Îslamê, lê belê pêşiya tundgiriye bigire û dide xuyakirin ku

divê li hemberî tevahiya van kuştinan bi awayekî eşkere bi axivîn ku bi hizrên tundrewane hatine encamdan: Ti bikujek, ji bikujekî din adiltir nîn e, ti qurbanî ji qurbanîyên din nêzîktir nîn in ji bo ku bibin armanc. Dîjatiya mirovahiyê, têrorîstên rastgîr û bikujên îslamgîr kirine hevalbend. Kereb û kîn ji şariştaniyetê, azadî, dêmokrasî û mirovbûn. Qurbanîyên van raştîyan jî hebvgirtî dibin ku mafê sereke yê jiyana wan, ji wan hatiye şandin.

Xuya ye êdî Ewropî dixwazin bi rengekî cidî li hemberî têrorî derkevin.

Ew didin xuyakirin ku heke em bixwaze bi awayekî berdewam ji bo civakeke azad, ji bo mafên mirovan di asta cîhanê de û ji bo jiyaneke baş xebatê bikin, nabe bi ti awayekî li hemberî kuştina xelkê bê deng bimînin. Divê dengê xwe hildin û wek pêkhateyeke çepgîr, nerazîtiya xwe nîşan bidin. Hekî bikuj îslamgîr bin, divê em bikarin Îslamê rexne bikin.

Di beşa dawiyê ya daxuyaniya Hevalbendên Çep de hatiye, her kesê ku Îslamî be, têrorîst nîn e lê belê ew dixwazin pêşiya Îslama Siyasî û tundgiriye bê girtin û tekezê dikin ku hekî em bê deng bimînin, wê demê em nikarin îdiaya azadiya cîhanî bicî bikin. Em weke projeyeke dijberên faşîstan, bi rengekî eşkere li hemberî her cureyeke bêbextiyê, helwesta xwe nîşan didin. Herwisa bi qurbanîyan re û bi wan kesan re ku hizrên mirovkujîyê bandor kirine ser wan, hev-girtî ne.

Lihevhatinên herêmî û paşeroja pirsê gelê Kurd



N: Ebdûlazîz Qasim

Tê pêşbînî kirin ku guherînkariyên mezin li Rojhilata Navîn de peyda bibin, hevdem ligel lawaziya siyaseta Amerîka û Ewropayê, ji aliyê dewletên herêmî ve hewldan hene, ji bo hin dewletên herêmî şûna Amerîkayê bigirin, ku îro li şûna nakokî û cudahiyan, hin hevpeymanên herêmî dikevin rojevê, helbet bi tevlîbûna dewletên dagîrker, Kurdistanê di nav her hevpeymenê de, dibe cihê metirsiyek mezin, lihevhatinên herêmî yên niha jî dibe ku bandoreke xirab li ser doza kurd çê bikin, nemaze di rewşa niha ya gelê kurd tê de derbas dibe, zêdebarî parçebûna Kurdistanê di nava 5 dewletan de, herwisa mixabin gelê kurd heta ji aliyê neteweyî ve jî, di parçebûnek navxweyî de dijî.

Mîrnişînên Ereban an jî “Emirate”, piştî têkiliyên vî yê berfireh ligel Israel û herwiha ji ber aboriya vî ya bihêz, ku îro weke dewleteke xwedîhêz tevdiqire, dîr nîne ku Emirat bibe dewletek biryarder, ku îro rolek vî ya mezin heye di rêxweşkirina têkiliyên welatên ereban ên ligel Israel û têkiliyên welatên ereban ên ligel Turkiye û herwisa têkiliyên welatan Ereban ligel Iranê. Ji aliyek din ve, em dibînin ku têkiliyên di navbera Saudi Arabia û Iranê de peyda dibin, û dîr nîne ku têkiliyên wan li ser Yemen, Syria, Lebanon û Iraqê bandor hebin, nemaze ku niha têkiliyên Saudi Arabia ligel Syria dikevin rojevê, û dibe ku



bazar di navbera wan de pêk hatibin, ku Saudi Arabia dev ji hevpeymanên xwe ên li Iraqê berde û li hember de jî, Iran dev ji Yemenê berde.

Di vî navbirê de, hevdem li gel lawaziya siyaseta Amerîkayê li devera Rojhilata Navîn de, dîr nîne ku Iran bi riya alîgirên xwe encamên hîlbijartinên Iraqê ên 2021'an pûç bike û siyasatên dijîminkarî ên hikûmeta Iraqê li dijî Hikûmeta Herêma Kurdistanê û gelê kurd bidomîne.

Turkiya ji aliyê xwe ve, hewl dide daku têkiliyên xwe ligel dewletên Ereba, Israel, Iran û Armenyan

bihêz bike, û herwisa Turkiye du di hemû têkiliyên de du armancên serekî li berçav digire, ku ya serekî li bara dijîminkariya pirsê kurd de ye, bi taybet li ser Rojavayê Kurdistanê, ku Turkiya bi hemû şîyan û senga xwe kar dike ji bo tinekirina pirsê kurd li Rojavayê Kurdistanê.

Li hember hewldanên asayîkirina têkiliyên welatên Ereba- Turkiye û welatên Ereba- Iranê, têkiliyên Îran- Turkiye ên ji bo peydakirina hevpeymanîyek nû li Qafqaziya bi piştgiriya Rusiya, di navbera Armeniya, Azerbeycan, Iran û Turkiye de, ku ew jî dibe cihê metirsiyek mezin li ser doza kurd bi giştî.

Li gor dîtingeha hin şirovekarên siyasî, rêkeftinên han nikarin kirîza Turkiye ya aborî çareser bike û herwisa nikarin kirîza Iranê ya navîkî jî, çareser bike, tevî ku gelek nakokî û cudahî di navbera dewletên herêmî û yê dagîrker de hene û heta di navbera hin ji wan de dijîminatî jî heye, lewra ev çavnehîrê têkîrin, ku rêkeftinên han demkî bin û bo demek dirêj berdewam nekin lê, tevî vî yekê jî, bi nerîna min heta ku ev rêkeftinên herêmî bo demek kurt jî bin, dê her bandoreke wan ya xirab li ser doza kurd bi giştî hebe, nemaze di vî rewşa bêtifaqiya kurdan de, ku heta niha Alaya Kurdistanê ji aliyê hin aliyên kurd ve tê şewtandin û wekî semboleke netewî nayê pejirandin.

Di parêzgeha Sineyê de pirsgirêka kêmiya mamostayan û gefa herifîna dibistanan heye

Birêveberê Giştî yê Wezareta Perwerde û Hînkariyê yê parêzgeha Sineyê “Reşîd Qurbanî” daye zanîn ku di wê parêzgehê de pirsgirêka kêmiya mamostayan û gefa herifîna dibistanên kevin bi ser dersxwanan de heye.

“Reşîd Qurbanî” tevî îşarekirin bi pileya 8ê ya wê parêzgehê li kêmbûna mamostayan li ser asta Îranê got: “Di wê parêzgehê de pirsgirêka kêmbûna mamostayan heye û herwisa beşek ji dibistan kevin û rizî ne û hewcehî bi nûjenkirinê hene û gefa herifîna wan dibistanan bi ser dersxwanan de gelek micid e. Navbirî ti zaniyariyek li derheq amara dibistanên rizî û kevin ên li wê parêzgehê de nedaye.

Dibistanên rizî û kevin û kêmbûna mamostatyan di wê parêzgehê de pirsgirêkek micid e û eger ew dibistan neyê nûjenkirinê rengehiya harifin bi ser dersxwan û mamostayan de heye, lê rejîma Îranê bûdceya hewce bo nûjenkirina wan dibistanan dabîn nake.



Salane 17.5 milyon ton berhemên kangehan li parêzgeha Urmiyê têne talankirin



Berhemên kangehên parêzgeha Urmiyê bi bê ti qazancek bo xelkê wê parêzgehê bo parêzgehên navendiyên Îranê têne şandin.

Cihgira Karûbarên Kangeh û Pîşeyên Kangehî ya saziya “Pîşe, kangeh û ticaret”ê li parêzgeha Urmiyê, “Perîsa Abidpûr” got: “Di 8 mehên destpêka salê de derfetnameya mifahvergirtin ji 27 kangehan liparêzgeha Urmiyê hatine wajo kiriye û di wan kangehan de salane dikarin 3 milyon û 594 hezar ton berhemên kangehî derbixin û paşkevta wan kangehan zêdetir li 226 milyon û 651 hezar ton e.

Herwisa wê berpirsa rejîmê got: “di 218 deverên parêzgeha Urmiyê de karê peydakirina kangehan berdewam in û bo peydakirina kangehên nû li 32 deverên dinê de jî derfetname hatine wajokirin û heta niha 15 kangehên nû jî peydakirine”.

Herwisa Perîsa Abidpûr got: “507 kangehên xwediyê derfetname li parêzgeha Urmiyê hene ku kar di wan de berdewam e û salane zêdetir li 17 milyon û 553 hezar ton berhemên kangehî ji wan têne derxiştin.

Wê berpirsa rejîmê gotiye: Di tevahiha wan kangehan de, 5 hezar û 186 kes kar dikin”; Lê navbirî bas nekiriye ku di her kangehê de bi awayê nêvîncî kêmtir li 10 kesan kar dikin ku piraniya wan kesan xelkê derveyî parêzgehê ne û bi wî awayî parêzgeha Urmiyê talan dikin.

Xelkê devera “Saral” bi awayek xwabexşane rêya navbera Dîwandere û Merîwanê çê dikin



Li gor vîdiyoyên ku hatiye belavkirin, xelkê devera “Saral” bi alîkariya xelkên deverên din û herwisa xêrxwazan, di hewayek sar de û li navbera du bajarên Dîwandere û Merîwanê mijûlê çêkirina rêya 15 KM ne.

Welatiyek di wê vîdiyoyê de bas vê yek dike ku heyama çend salan e daxwazkar in ji rejîma Îranê ku wê rêyê çê bikin, lê heya niha ti karek bo wan nehatiye kirin.

Ew welatiye bas vê yek dike ku serdana cihê pêwendîdar ên dewletî kiriye û wan hemû demê daxwazên xelkê pişt guh xiştine, lewma ti çareseriyek bo wan nemaye û xelkê deverê bixwe dest bi kar bûne.

Rejîma Îranê ti girîngiyek bi xizmetguzariya rêyên Kurdistanê nade û rêyên Kurdistanê bi “rêyên mirinê” têne nasîn û her sal dehan û sedan welatî dibine qurbanî.

Li Stenbolê bi folklor û govendên Kurdî bajarên Kurdiştanê didin nasandin

Li bajarê Stenbolê yê Tirkîyê, bi kincên Kurdî û govendên Kurdî, sê parêzgehên Qers, Erdexan û Îdirê yên Bakurê Kurdiştanê tên nasandin daku geştyar ji bajarên li rojavayê Tirkîyê ve berê xwe bidin wan bajarên Bakurê Kurdiştanê.

Ji bo pêşxistina sektora geştyariyê li hersê parêzgehên Qers, Erdexan û Îdirê yên Bakurê Kurdiştanê, çalakiyek li Stenbolê tê lidarxistin. Çalakî dê ji sibe Pêncşembê 16ê Kanûnê ve destpê bike û ta 19ê Kanûnê bo dema 3 rojan bidome.

Ji bo wê yekê jî, roja Sêşembê 14ê Kanûna 2021an li taxa Kadikoy ya Stenbolê, çalakiyeke vexwendinê hat lidarxistin. Di çalakiya vexwendinê de, folklorê navçeyên Kurdî yên hersê



parêzgehên Qers, Erdexan û Îdirê û ji wan kincên Kurdî yên xelkê herêmê û muzîk û govendên Kurdî hatin nîşandan.

Tîma govendê ya geleri bi cil û bergên resen ên herêmê li ber muzîk û şîranên Kurdî govend gerandnin û welatî jî tevli govendê bûn.

Herwiha di çalakiyê de folklorê xelkê Kafkasyayê jî hat nîşandan.

Çalakî piştî destpêkirina geştên trena Ekspresa Rojhilatê tê lidarxistin, ku vê heftiyê ji bajarên Tirkîyê ber bi Bakurê Kurdiştanê ve geştên xwe destpê kirine. Trena Ekspresa Rojhilatê ji bajarên Tirkîyê ve ber bi Sêwaz, Erzîngan, Erzerom û Qersê ve diçe ku stasyona dawî Qers e.

Piştî şanoyên govenda geleri ji beşdaran re pilafê goştê qazê herêmî hat pêşkêşkirin.

Li Bakurê Kurdiştanê gotineke navdar heye ku dibêje, eger di demsala zivistanê de çûyî Qersê, eger te goştê qaza kurdewarê û penîrê xwecihî nexwar, serdana te betal e, ew jî ji ber ku goştê qazê li Qersê yek ji xwarinên taybet e û penîrê navçeyê jî nav û dengê xwe heye. Ç: RÛDAW

Qesra Merwaniyan di nava Keleha Diyarbekirê de hat vedîtin

Li Diyarbekirê bi lêkolînên Pisporê Dîroka Merwaniyan Doktor Erefat Yaz Qesra Merwaniyan hat vedîtin. Qesir di nava Bircên Diyarbekirê de cih digire û teqrîben 1000 sal barê hatiye avakirin û xebatên derxistina holê ya qesra dîrokî didomin û Doktor Erefat Yaz bang dike ku divê demildest bo vedîtin û parastina berhemên wisa komîsyonek were avakirin.

Di nava Bircên Diyarbekirê ên navdar û dîrokî de berhemek wisa hat kifşkirin ku ji aliyê dewleta Kurd Merwaniyan ve 1000 sal berê hatiye avakirin. Ev berhem Qesra Merwaniyan e. Di nava Sûr a Diyarbekirê de 18 jê di nava keleha de 82 jî derveyî keleha de bi tevahî 100 birc hene. Berhema hatî dîtin Qesra Merwaniyan di nava birca 75. de cih digire. Qesra Merwaniyan bi hewildan û lêkolînên Pisporê Dîroka Merwaniyan Doktor Erefat Yaz hatiye kifşkirin. Qesir di Keleha Navîn de li aliyê Rojhilatê Bakurê û Qesra Hikumdarê Merwaniyan Ebu



Tahir Yusif Bîn Dimne ye. Doktor Arafat Yaz dibêje berhema ku derketî holê berhemek girîng û hêja ye û divê bo derxistin û parastina van berheman komîsyonek teybet were avakirin.

Pisporê Dîroka Merwaniyan Doktor Erefat Yaz ji K24ê re got: “Qesra Merwaniyan ji aliyê Ebu Tahir Yusif Bîn Dimne di navbera 999-1024-25ê de teqrîben 1000 sal berê hatiye avakirin. Ebu Tahir Yusif Bîn Dimne piştî ku dibe walî û vê derê bi dest dixwe li cihê herî xweş, di nav Keleha Diyarbekirê de qesrê çêbike. Li vê derê hember Çemê Dicleyê ku dîmenek xweş e qesrê çêdike.”

Pisporê Dîroka Merwaniyan Doktor Erefat Yaz di wê baweriyê de ye ku hîn gelek avahiyên girîng û bedew di nava Keleha Navîn de hene ku li benda rizgarkirinê ne û gelek berhem jî ji ber sedemên cûrbecûr zirar dîtine û hîn jî dibînin. Derbarê Qesra Merwaniyan de nîqaş jî hene ku tê îddakirin ew avahiya wek Qesra Merwaniyan tê pênasekirin di raştiyê de cebîlxane ye. Lê Doktor Erefat Yaz dibêje bi belgeyan eşkere ye ku ew avahî qesra Merwaniyan e.

Doktor Erefat Yaz dibêje: “Îbnûl Ezrak behsa vê derê dike, di qerna 12. de jiyaye. Yê yekem behsa vê derê dike ew e. Dibêje, qesir li Rojhi-

latê Amedê ye, ser silsileye ye, silsile jî Fîskaya ye. Tiştê ku gumana cihê qesrê zelal dike ew e ku Îbnî Xaldun dibêje ew qesir bi dîwarê Bircên Diyarbekirê ve zeliqandî ye. Evliya Çelebî jî wexta tê Diyarbekir bo vê qesrê dibêje ji aliyê Mehmet Paşae Bisimbêl ve hatiye çêkirin lê dîwanxanek nava qesrê de ye ku ew dîwanxane ji beriya siltanê wê demê maye.”

Dewleta Merwaniyan dewletek girîng a Kurd e ku di navbera salên 983-1085ê de ji Erdeşêra Wanê heta Neynewayê desthiltdarî kiriye. Dewleta Merwaniyan girîngî daye çand, huner, zanîst, avahîsazî û endazyariyê ku berhemên girîng û navdar ên wek Pira Deh Derî, Birca Keçikê û Pira Malabadê di serdema Merwaniyan de hatine avakirin û xaniyên dîrokî yên Mêrdînê jî bi parastina û xwedîderketina Merwaniyan ji ruxînê rizgar bûne û bi keda Merwaniyan dîmenê bedew ê Mêrdînê gihiştîye roja me. Ç: Kurdiştan 24

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Berdewamiya binçavkirin û nexuyayîya qedera du welatiyan

Qedera du welatiyên Kurd ên bi navên “Ferheng Êvezî”, kurê “Mihemedelî”, temen 30 salî û “Kejal Nesrî” temen 26 salî û keça “Mihemed” û xelkê gundê “Tengîser”ê girêdayê bajarê Sineyê piştî binçavkirinê nexuya ne.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, malbatên wan du welatiyan bo agehdarbûn ji qeder û cihê ragirtina wan, serdana navendên ewlehiyên bajarê Sineyê kirine lê ti bersivêk serast wernegirtine.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: Ew du welatiyane di heyama binçavkirinê de ji peywendiya telefonî, hevdîtin digel malbata xwe û dêstpêregihîştina bi parêzer hatine bêparkirin.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: Nerohnbûna qedera wan du welatiyan, nigeraniya malbatên wan li pey xwe anîye.

Roja Yekşemî 21`ê Sermawezê, “Ferheng Êvezî” û “Kejal Nesrî” bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîma Îranê ve hatibûne binçavkirin û bo cihek nexuya hatine veguhaştin.

“Kejal Nesrî”, çalakvana medenî ye û di warê paraştin ji jîngehê de çalakî hebûne.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan du welatiyan hatiye sepandinê ti zanyariyek li ber deşt nîne.

Girtiyekek xelkê bajarê Îlamê canê xwe ji deşt da

Girtiyekek bi navê “Rûhullah Melekî” temen 30 salî kurê “Elîebas” xelkê bajarê “Mêhran”ê di girtîgeha bajarê Îlamê de bi sedema xemsariya perpîrsên girtîgehê û xirabiya rewşa tendirustiyê, canê xwe ji deşt da.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, ew girtiye li roja 9`ê Sermawezê piştî 4 roj ji gireva birçîbûnê bo nîşandana nerizayetiya xwe li hember nexuyayîya dosiya wî ya 10 sale li odeya takekesîn ya girtîgeha bajarê Îlamê bi xwarina derman hewla xwekujiyê dabû û piştî wê hewla “Rûhullah Melekî”, ew bo navenda dermanî ya girtîgehê hatibû veguhaştin û me`idê navbirî şuştibûn û bi bê çavedêriya pizîşkî û di demekê de ku rewşa tendirustiya wî nebaş bû, dîsan bo girtîgehê zivirandibûn.

Herwisa wê çavkaniyê got: Ew girtiye di demekê de zivirandine bi girtîgehê ku rewşa wî ya tendirustiyê nebaş bûye û berpîrsên girtîgehê li derheq rewşa tendirustiya navbirî xemsar bûne ku piştî têkçûna rewşa tendirustiya wî, ew bo navenda dermanî ya girtîgehê veguhaştibûn û roja 10`ê Sermawezê canê xwe ji deşt daye”.

Herwisa wê çavkaniyê daye zanîn: Di duyemîn roja gireva birçîbûna navbirî de hêzên girtîgehê navbirî kutane û îşkence kirine û piştî bo odeya take kesî veguhaştin.

“Rûhullah Melekî” li 16`ê Reşemeya sala 1391`an bi tohmata “kuştina bizanebûn” hate binçavkirin û li sala 1392`an ji aliyê dadgeha Îlamê ve bi îdamê hatibû cezadan.

“Zana Kesrayî” bo cîbicîkirina cezaya wî bo girtîgeha bajarê Merîwanê hate veguhaştin

Roja Sêşemî 23`ê Sermawezê, welatiyekî Kurd bi navê “Zana Kesrayî” temen 28 salî kurê Hîwa û xelkê gundê “Nê”yê ser bi bajarê Merîwanê bo cîbicîkirina cezaya wî bo girtîgeha wî bajarî hate veguhaştin.

Roja Şemî 27`ê Befranbara sala 1399`an, dadgeha Şoreş a bajarê Sineyê cezaya 3 sal girtîgeha te`izîrî li ser wî welatiyê Kurd sepandibû.

Dadgehê ew welatiye bi tohmata “Endambûn li yek ji Partiyên Kurdî yên dijberî rejîma Îranê” bi sê sal girtîgeha te`izîrî cezadabûn û navbirî ji tohmata “piropagende li dijî rejîmê” bi bêtawan hatibû naskirin.

Ew welatiye nerizayetiya xwe li hember cezaya dadgehê nîşan dabû û dosiya wî bo pêdaçûnê bo dadgeha pêdaçûnê ya bajarê Sineyê hatibû zivirandin ku cezaya wî bo yek sal girtîgeha te`izîrî hatibû kêmkirin.

“Zana Kesrayî” roja Yekşemî 29`ê Pûşpera sala 1399`an bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberî rejîma Îranê” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî li bajarê Sineyê hatibû veguhaştin.

Ew welatiye piştî 22 roj binçavkirinê û bi dawîhatina heyama lêpîrsînê bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (412)



YELDA

HEZKIRINA RÊBEREKÎ DI

CESTEYÊ NÎŞTIMANÊ DE



DEZGEHA GIŞTÎ YA
RAGIHANDINA PDKÎ